Welat 17
01/01/2015
Çandî - Giştî - Serbixwe

# SERÊ KANIYÊ 2015 TU BI XÊRHATÎ



# Welat



Xoşî

*Kovara* **WELAT**
Çandî- Giştî- Mehane

*Sernivîser:*
**Aras Yûsiv**

*Desteya rêvebir:*
**Xweşnav Heso**
**Mihemed Zekî Mihemed**

*Dizayner:*
**Hesen Berzencî**

**Têbînî**: mijarên ku di kovarê de belav dibin, nerîna xwediyê xwe ne û nivîskar berpirsê wê ye

*Mafê çap û ji bergirtinê, ji kovara WELAT re, parastîne*

**ji bo têkiliyê:**
welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

# PEYVA WELAT

## Saleke nû di nav şer de

**Aras Yûsiv**

*Ev ne sersala tekane ye ku li Sûriyê di nav şer û xwînê de derbas dibe, lê ev bûne gelek sersal li pey hev ku tevî hemî hêviyan bi aştiyê, aramiyê û bidawîanînê li şer derbas dibin û her salek ku di nav vî agirî de berdewam dike kuştin û wêrankirin bêtir dibe û azarên xelkê jî bêtir dibin.*

*Di van salên dirêj de ji şer li sûriyê herêmên kurdî jî mîna hemî herêman para xwe dîtin çi ji kuştin û revandina sivîlan an koçkirina wan , hevdem herêmên wan bi xwe jî rastî teqîn û wêrankirinê hatin, ew herêmên ku ji berê ve ne xwedî şens bûn di warê geşpêdan û pêşketinê ji ber siyasetên rêjîma Esed dermafî kurdan.*


*Bi hatina sala nû re li her deverekê ji cîhanê xweziyên mirovan ew in ku bêtir aramî û xweşhalî çêbibe, tenê li çend welatan û di nav de Sûriyê hêvî ew e ku çek werin danîn û dengê şer neyê bihîstin da ku dengê aştî û biratiyê bêtir were bihsîtin , da ku bajar ji nû ve ava bibin û penaber vegerin cih û warên xwe û malên xwe yên wêrankirî ava bikin û deriyên xwe yên girtî vekin .*

*Bi helkefta sala nû saziya Welat ya ragihandinê jî hin hêviyên wê hene û ew jî ku ew karîbe ne tenê di hevyê de carekê de kovara Welat biweşîne û ne tenê rûpelên wê wek xwe bimînin , hevdem saziya Welat hêvî dike ku kovara wê bigihêje her maleke kurd û bibe mêvaneke wan ya berdewam.*



تبنّى ثورة
adopt a revolution

# Xwedawenda Jinê li Cizîrê .. li Gorî jêderên Arkolojî



Izedîn Salih

Mirov ji destpêka xwe de li Gerdişin olî taybet bi xwe digeriya ji bo pê rabe,da ku tirsa dilê xwe ji xeşima nemandên xurist derxîne,û geftbûna vê mijarê li cem mirov ê Kevin dihişt ku ew tim li Xwedanê xwe bigere,û ji ber ku anîna zarokan di Serdemên Kevin de gelekî nirxbûha bû û tenê li cem Jinan peyda dibû, vê yekê hişt ku Perestiya Jinê cihê xwe di dîroka Şaristanyên Kevin de bigire.

Xwedawenda Jinê li Herêma Cizîrê bi awayekî berfireh peyda dibû ji ber ku Jin ew bû ya ku Çandinî li wê devrê nas kir û pêşkêşî Şaristaniyê kir,bi vê sedemê geftbûna Jinê ji Serdemê Niyolîtî (hezarê dehan B.Z) de bi xurtbûn berz bû,Herwiha di bêtirîn çeperên Niyolîtî pût û (Xwedana Dayik) û Gerdişên perestiya wê dihatin dîtin.

Nasnavê Xwedana Dayik di Serdemên berî Dîrokê de nenas bû,lê Piştî ku mirov Nivîsandin naskir (3200 Sal B.Z) Balkêş bû , Vêca li cem Mîdiyan bi navê Anahîta,li cem Someriyan Anana,li cem Akadiyan,Eştar,li cem Mesriyan Îzês,li cem Hûriyan Şawişka,li Cem Yûnaniyan Efrodêt,li Cem Rûman bi navê Vînûs dihate naskirin,Mirovê kevin giringî dida awayê Pûtê Xwedana Mê û bêhtir ew rûniştî û laşê wê lihevhatî çêdikir û çehirên Mêyetiya wê derdixist û pêsîra wê berz dikir,ev Pût li Cihên Taybet bi Gerdişên Olî dihatin danîn.

Karên lipêçûn û binkolînê li çeperên cihereng li Cizîrê berhemên giringiya Xwedana Mê derxistin,bi taybet li herêma Tel Helefê li ser sînorê Turkiyê nêzîkî bajarê Serê Kaniyê ya ku şaristaniya wê (4500 – 5500s B.Z) dirêj kir,û ji çeperên wê bi dehan pûtên Xwedana Dayik hatin derxistin piştî ku binkolînvanê Elmanî Fon Obinhaym lê binkolîn kir û yek ji Pûtên ku wî ji Tel Helefê derxist,xelkê wek Bûka wî binav dikirin ji ber ku wî çavê xwe ji ser ranedikir û gelekî jê hez dikir,Herwiha li Tel Keşkeşok Nêzîkî bajarê Hisiça jî Pûtên biçûk yên Xwedana Dayik ku ji qehfê çêbûne û vedigerin (6000s B.Z) hatin dîtin,û li herêma Şaxir Bazar di navbera Bajarê Hisiça û Amûdê de jî Şandeyek Arkolojî bi serkirdaytiya Max Malon di sala 1935an de pûtek Xwedana Dayik ku ew Avise dîtin û ew pût di Mozexaneya Niştîmanî ya Helebê de ye






# Çîroka Kobanê ji avakirinê ta berxwedanê,ji cûdakirina wê ji Helebê ta hewildanên (Da,IŞ)

**Dr . Azad Ehmeh Elî**

**Wergerandin: Mihemed Zekî Mihemed**

Serkeftina Kobanê ne ji dema karîna wê ji rûbirûkirina êrîşên (DA,IŞ) û ne piştî gurbûna guhdana ragihandina cîhanî bi wê destpêkir,lê ji çaxê avakirina wê wek bajrekî perîşan û ji bbîrkirî,li kinarê sînorên navdewletî yê hatî nîgarkirn di navbera Tirkî û sûryê de,li dirêjahiya riya rêhesina rojhilat a lezok di destpêka sedsala bûrî de ye.

Êrîşên rêxistna ( Dewleta Islamî ) li ser gundewar û navenda bajarê Kobanê,rê li pêşiya gelek pirsan vekir,armanc ji vê êrîşa dirinde çiye,rêxistina dewletê wê çi qizincê bike ji bandorkina vî bajarî bi taybetî,çima ev hemî ziyan û qurbanî?

Pirs pirbûne,bersivdana pir dijwar dibe,bê ku em cudawaziyên herêma Kobanê binasin,ji loma pêwîste em li giraniya wê ya istratîcî vegerin,da ku alîkariya me di veikirina hêlekê ji aloziyên bûyer û pirsgirêkê bike.

Çîroka serkeftina Kobanê ji çariya pêşîn ji sedsala bûrî destpêkir,dema ku durvên wê wek navendeke şarwerî bicûk diyar bû,ji kombûna malbatin kurd ên şarwer û koçberên Ermen ên serdema cenga cîhanî yê yekem ku ji ber zorbaziya destlatên osmanî reviya ne,hatiye damezrandin,paşê fireh û geşbû,û dibe şar ji gudewrarekî fireh li roj hilatî ferat.

Sînorên herêma Kobanê,ji destpêkrina peymana San Rîmo (1920) an peymana Enqera sala(1921) an di navbera Firans û Hikûmeta tirkî de,dihate danîn û çespandin,hemberî vê,di vê Turkiya bi mandata Firansa li sûryê mukir we re.

Peymana Lozan sala (1923) ji rewatiya vî sînorî re palpişt bû,peymana ku biryara peymana Sîver (1920) an ya di hundirê wê de avakirina Dewleteke kurdî di herêmên ku dikevin rojhilatî Çemê Ferat,ku piraniyan wan kurd in were avkirin,wisa jî tevayî ya wilayeta Musil.

Di naveroka xwe de Peymana San Rîmo û Enqera ne tenê guhertin bû,Lê belê ji belê ji kokrakirin û binpêkirina peymana Sîverê bû ya ku piştî cenga cîhanî ya yekem hatibû emzekirn ku têde rûbara hin herêmên Turkiyê hatibû kêm kirin û avakirina dewleteke kurdî di hin wilayetên dewleta Osanî ya berê de.

Tişên di piratîkê de hate misogerkirin,hin herêm ji wilayeta Diyarbekir,û beşine mezin ji deştên (Wêranşehir) û (Sirûc) tevlî Sûryê bû,ya ku wek dewlet nû dihate avakirin,mîna yekîtiyekê ji herêmên fîdral di siya mandata Firansî de.

Pirosêsa danîna sînor bakurî riya Rêhesnê (turkiya) û başûrê wê (Sûryê),perçebûnek di tevna şarwerî – civakî ya kurdî de çêkir,vê yekê gundewarên vê deverê ji danûsatndinê bi bajêrên Kurdî yên dîrokî di devra navîn û bakur ji deştên Cizîrê mîna Wêranşehr,Sirûc û Rojava pê parkirin.

Ji loma pêwîst bû ku nişteciyên ku li başûrê sînorê Sûryê- Turkiya bajar û bazaerke nû avabikin,cîgehê (Kaniya Ereban) hate hilbijaritn ku wateya wê bi Zimanê Erebî (Eyin El,ereb) e,ev nav li Kaniyeke avê vedgere,ku pez û sewalên hozên Erebî li derdora wê datanîn,bi zimanê kurdên herêmê navê wê (Kaniya Ereban) e,dibe navedeke rêvebirî û bazareke nûhatî.

Bingeha pêşîn ya bajarê Kobanê li dora navendeke komapaniya Almanî ku,riya Rêhenê sazkir hata danîn,Kobanê navê xwe ji kurtkirina nave (kompanî) biriye.

Çîroka vehewndina Kobanê ji derdora wê ya şivantî û gundewarî ya ber fireh ku rûbara wê nêzîkî (4000) Km2 hûnand,bi deştên fireh ku piraniya wan hoz û êlên Kurd lê cîwar bûbûn,yên ku li çol beriyên rojhilatî Ferat û bakurê bajarê Reqa ta rojhilatî bajarê Hemayê digereyan,hate girêdan.

Ev guhertina mezin di avkirina herêmê de,bêyî ku pirojeyek jê re hebe,ku bi navendeke şarwerî ve were girêdan,lê pişt re herêma Kobanê bi mezintirîn û nêziktirîn bajar li bakurê Sûryê,ew jî Heleb e,ku (160) km î di keve rojavayî Kobanê,hata girêdan.

Herêma Kobanê giringiya xwe ku ji xaknîgariya wê ya navîn tê hilavtin parastiye,lê ji hêla rêvebirî û piratîkî ji Cizîrê hate derxistin û tevlî parêzgeha Helebê bû,beşekî bicûk ji gundewarên wê bi parêzgeha Reqa yê ve hatin girêdan,ku di sala1960 î de Hatiye

damezrandin.

Ji encama van kiryaran,têklî û peywendiyên civakî,aborî û siyasî di navera Kurdên Cizîrê ( parêzgeha Heskê ) û Kurdên Kobanê,ku ji mêj ve di riya deştên Wêranşehr û Serê Kaniyê,di riya dîrokî ve,ku Heleb bi Mûsilê ve girêdida,hate birîn.

Peywendiyên civakî û rêvebirî bi sedê salan dirêjkiriye,berî parçekirina Kurdistanê,piştî cenga cîhanî ya yekem.

Paşê jihevxistin û wêrankirina herêmên kurdî li bakur û rojavayî Sûryê,bû mijar û armanc ji siyasetên dewletê re ku partiya deshilatdar li Şamê pîlan danî bû.

Ji bo çespandina armanca jihevxistina herêmên Cizîra jorîn,hikûmeta Sûryê,xakên xandanên Kûrd li rojavayî Serê Kaniyê desteserkirin,bi taybetî mewdanên malbata ( Ibrahîm Başa yê Milî ),ew jî dibin siya durûşma çaksaziya çandiniyê,wisa jî dûzkirina riya niştecîkirina hin hozên Ereb yên koçer li rojavayî wê,li navçeya (Solûk) û herêma Til Ebeyed ( Girê Sipî ).

Piştî demeke din,herêmen kurdî bi sedema piştguhkirin û dorpêçkirina ji hêla siyasetên hikûmetên ku li pey hev desthilatdarî kirine,ji hevketin tevî Kobanê ku di bin siya van siyasetan de jî çîroka serkeftineke mezinbûnê û geşbûneke aborî nivîsand.

Kobanê taybetmendiya xwe û têkilî û hevkariya civakî di navebera hozên xwe de pararst,nişteciyên herêmê berê xwe dane karên azad û çandiniyê dûrî pişgîriya hikûmetê.

Wisa jî karîna wê ya bêhempa,ku dikarî Kurdên Cizîrê bi Kurdên ku li herêmên rojava ji Sûryê li herêmên: Elbab,Til Eren,gundewarê bakurê Helebê,Efrîn,Çiyayê Kurdan li Laziqiyê,Hema û Humis, û xwezayiya êlîtiyê li herêmên Kurdî li rojavayî Sûryê ji koka êlîtiya hozên Kobanê bi xwe ye,tenê wek nimûne mîna hozên berazan li parêzgeha Hema yê.

Kobanê dikarî xweser bêyî piştgîriya hikûmetê,ta asteke bilind li ser berhemên xwe jiyana xwe berdewam bike,ew ji gundewarekî berfireh rûbara wê dighêje (2730)km î pêktê,herêma Şiyûx û Sirîn pitî kobanê tê,tevayiya gund û zeviyên wan bêtirî (400) ye,li gorî serjimara fermî ya dawî jimara şêniyên wan (363000) e.

Tevî ku xwedîkirina pez û şivantî ji kevn de li kobanê sîdar e,di navîna sedsala bûrî de çandinî, nemaze ya avdayî ( Pembû,genm..) geşbû,ta ku gavek di di serkefitina jiyana çandinyê de bidestxist,dema ku di salên bûrî

De darên Fisteq Helebî,gwîz û loz çandin.

Îdî serkftinên kobanê li pey hev hatin,dema ku pisporiyeke bilind di pîşesaziyê de wergitin,bi çêkirin û nûjenkirina amûretên çandinyê,bi taybetî Xeraxeyên kolana bîrên kûr û amûrên hildana avê,û gelek alavên teknîkê yên din,giha pilya belavbûna xelkên wê li Asiya û Efrîqiya ji bo kolana bîrên ava vexwrinê,bi alavên ku wan bi xwe sazkirin e,di hildana avê ji kûrahiya bêtirî 500 kîlomitrî de jî bi serketin.

Kobanê gulvdanek pîşezasî û avekerinê bi destxist,bajar fireh bû,pîşesazên amûrên çandiniyê û mast hatin çêkirin,tevî du pîşesazên konkirîtê yek bi hevpariya turkiyê ( Gorş),ya din mezintirîn kompanî bi parên Firansa (Lavarc) li gundê (Çelebî) hate avakirin,sirmiyanawê bêtirî(680) milyon dolare,berhema wê ya salane dora (3) milyon ton e,firotinên wê jî nêzîkî (240) milyon dolar e.

Piştî serhiladana Sûryê,bi hezaran malbat,nemaze yên Ereb,ku Herêmên wan bumbaran û wêran bûn,berê xwe dane Kobanê û gundewarên wê û dibe cîgeh û lûsek ji sivîlan re.

Dixuye ku ev jî sedemeke be ku " DA,IŞ" Kobanê ji xwe re kir armanc tevî xêr û bêrên wê û abora wê ya geşbûyî,wisa jî nîzêkiya dergehê wê yê bazirganî ji sînorê turkyê,ji ziyanên birayra vî şerî bêtirî du hezar kesî jiyana xwe ji destdan,ziyana aborî ya mezin ku dora (3,7) bilyon dolar e,di be ku di dawiya havîna sala 2015 an de bi gihe (5) bilyon dolar î.

Kobanê çîroka ezmûneke bêhempa ye,ji geşbûn û pêşketina herêmeke Kurdî ji bîrkirî li navîn û bakurê Suryê,dikare bi herêmên Cizîrê li rojhilatî xwe,bibe yek,da ku bibe bingeh ji herêmeke berfir re û derveyî desthilata Şamê geş û mezin bibe.



# Li bajarê Hesekê...
# zarok û tundetûjî

Xalid Umer

Ev bêtirî mehekê ye,bajarê Hesekê di aramiyê de ye,piştî pevçûneke dûdirêj di navbera rêjîm û çekdarên ku di nav taxa Xwêran de bûn.

Helbet di aramiyê de,bandora demên ne aram rûdidin û berçav dibin, û zarok ji vê bandorê ne bê parin.

Bi avêtina bombeyan û dengê mûşekan û teqandina mayinan û herifandina xaniyan û sifinga xaniyan û banê xaniyan bi ser xwediyan de,van zarokan jiyana xwe dişopand û berdewam dikir,tirs,saw û ne li serheviyê jî derûnên wan diguvaşt û fîzyolojya mejî û laşê wan ne wek xwestî diguherand,û ji encamên wê bi dehan zarok saw vegirtî û tirsandî bûn, û tundî jî di nav wan de xurt bûye,lîstikên wan jî hatine guhertin,ku li kolanên bajêr diyardeya lîstikên mîna [demançe,tifing,fetaşê ser destan...] pir bûye.

Kîn û rikiyê jî rêya xwe şaş nekir di nav hestên firişteyên buhiştê de,ew jî wek hin mezinan Erebtî û Kurdîtiyê di nav kolanan de gûrdikin,pevçûna zarokên Kurda û Ereban di dibistanan de pir bûye,wek hinek mamosteyan ji me re ragihand.

Ji aliyê xwe ve jî,rêjîm hîna noker û destekên xwe di bajêr de dilivîne,li ser benê pêkhateyan dilîze û vê yekê gûrdike.


wêne : ji internêtê

Îcar,gelo saziyên civaka şarewer [sivîl] û dezgehên hevjiyana aştiyane hemberî vê bobelata ku îro çare jê re nebin,li kû ne?.

Sibe emê gelekî êş û azariyên civakî bibînin.

Me gelek ji van sazî û dezgehan dîtin,piraniyên wan dibêjin: Em naçarin li ber nakokiyên siyasî,em li ber ger û tevgera rêjîmê di bajêr de naçarin,em naçarin ji ber kêmaniya pêdivî û alavan.

Pirsa mezin dimîne ji rêber û xwedîgotinan re di civaka kurdî de, Gelo ev zarokên ku perwerde dibin bi dîmenên kujtin û tundiyê ne paşeroja me ne?.


wêne : ji internêtê

## ذكريات رسائل منسية

روني علي

حين أتذكر
تقذفني الأمواج إلى شواطئ
حلمت يوماً
أن أسكن رمالها
قبل أن تلدغني عناكب الليل
وتسقط من ذاكرتي
جعبة النسيان
حين أتذكر تتساقط أوراق الشجر
من أغصان الحلم
فتبحث دودة القز عن خدكِ
لتنسج من هيامي
سجادة العبور
إلى مملكة الرعشات
حين أتذكر
تعبر المدن كلها
إلى رصيف الانتظار
وتتربعين وحدكِ
بعلم مزركش
من ريش العصافير
عرش الوجود في صومعة الحنين
حين أتذكر
كل الأزقة تمتحن صبري
في موجة الرحيل نحو السراب
وبتلات زهرة تيبست
تبث لوعة الذكرى من حقيبتي
كلما هبت من أضلعي
نسمة العناق مع صفعات الألم
وحين تنتشلني الذكرى
من كسوف شمس الأحلام
يخرج المارد من جحر الهدهد
ليلعق محفظة رسائلي المنسية
في ركن منزلنا الناجي من سيوف الدعوة
فتنثر القُبلات المسمومة من كلمات
لم تقّبل مبسم الذكريات

## HÎNA ZÛBÛ

**Hozan Girkundê**

Hîna zûbû
ji dilê min te barkirî
ma çi bibû
ew xeyda,te dil û raman
talan kirî.
hîna zûbû
Evîna te,ew bihna te
hîn li çola buhara min
dikin girî ...
hîna zûbû
Te hestên min
tev şikandin
te jîna min bi xwe re
pîr kir.
Li kolanê vê gerdûnê
bela kirim
li ber deryê kul
û derda gelek dêşim
Te ez hiştim
li şûna xwe
çi tiştê xweş
te bi xwe re birî
hîna zûbû
Ew kulîlkên
me çandibûn
hîn zarokin
ew maçên te
di bêrîkên xewnê
min de.
Heyv û rokin
xweş hevokin
hîna zûbû
Em tenêbûn
te çi digot min
bawer kir
dest di dest de
çav di çav de
heta sibê em
şiyar bûn
qet ji hevdû
em têr nebûn.
Çima wa bû?!
bakî dijwar
li me rabû
gelo raste
guneh karim
bêje perî
û hîna zûbû
wilo wilo
Te ez kuşt im
di nêv pirsên
awirên xwe
te ez biriştim
gelek caran li ber
pêjna nîgaşên xwe
te ez rist im
ji dilê xwe bawer
meke derewîn e
xapînok e
ji bala xwe te min
avêt bi erzanî
bi wê ava azariyan
te ez şuşt im
hîna zûbû
Ji ber ez im min dil da te
min xew da te
min dem da te
û min rastî da te
û te çi dixwest
min dida te
erê erê ji bona te
mest û dîl bûm
hîna zû bû
Va tê here
ti bi xwedêkî veneger e
nema ji te bawer dikim
ne ji xapên hêsirên te
û ne ji tîpên zimanê te
nema bo te
wekî berê gelek dêşim
ji êşê re xaçirêk im ez dildar im
ji lewra ez wêneyên te
xeyala te
her tiştên te
ji serê xwe
dûr davêj im
û hîna zû bû....

## Komara bêhest...

**Îmad Şêxanî**

Ji nû bi atûma tenahîyêre
Dibim yek…
Hewsên min min digerîne
Di reş tarîya tenahîyêde
Ji nû kavilên bîranîa
Mejîyê min dugvêşe
Vedenga peyalên evînê
Mîna zingilekî…
Perda guhê min di qetîne
Dîl dibim di barûyên
Tursêde…
Dîsa mebestên min bûne
Şev pist…
Dîsa bi sîya sawîrê xwere
Di axivim…
Ger ne hûnbin
Kevalek bê rengim
Nivêjek bê katim
Komarek bêhestim
Komara bêhest…

Ji nû bi atûma tenahîyêre
Dibim yek…
Hewsên min min digerîne
Di reş tarîya tenahîyêde
Ji nû kavilên bîranîa
Mejîyê min dugvêşe
Vedenga peyalên evînê
Mîna zingilekî…
Perda guhê min di qetîne
Dîl dibim di barûyên
Tursêde…
Dîsa mebestên min bûne
Şev pist…
Dîsa bi sîya sawîrê xwere
Di axivim…
Ger ne hûnbin
Kevalek bê rengim
Nivêjek bê katim
Komarek bêhestim

# Perîka mirovahiyê...

## Hevpeyvîn bi şêwekar Xunav Salih re..

**Xunav Kano**

**Xunav hesen salih şêwekarek ji bajarê Qamişlo ye derçûya zanîngeha hunerên bedew li Şamê ye sala 2006 an, bi asteya yekemîn di pisporiya wênegirtina zeytî de, u dibloma xwendina bilind di eynî pisporiyê de bidestxistiye, di gelek serhatiyên hunerî de derbas bûye ta ku li dawî dibistana tecrîdî u ya derbirînê u sûriyalî u sembolî hilbijart u tê de bi serket, bêhtir demên rojê nêgar dike, wek elendê, êvarê, u roj dema diçe ava,**

Kovara"Welat" serdana şêwekar"Xunav"kir u hevpeyvîn li gel wê çêkir:

**1-kengî u li ku te behremenda xwe ya nêgariyê nas kir?**

Ji destpêka ku min çavê xwe li vê gerdûnê vekir, temenê min nêzî pênc salan bû dema min dest bi nêgariyê kir, u di wê demê de min hest kir ku asteya min li gorî temenê min pir baş e, kesayetiyên kertonî u riwên jinan min nêgar dikir, Herweha di wê demê de roniyên dûr weke aso pir bala min dikşand, u hestek bi min re çêbû ku tiştek dûr heye lê ew pir xweş e, wek hêviyekê ji min re çêkir..

**2-çi şêwazê ku tu bi kartînî ji bo tu peyama xwe bighînî bîner ?**

Peyama min ew e êşa mirov bobelat u hêviya wî, herweha şêweyê min gelek dibistanan bi kar tîne wek ya tecrîdî herweha dibistana derbirînê u ya sembolî u hinek seqayên soryalîsimê jî tê de hene…

**3-kîja dîmen bala te dikşînin u te neçar dikin ku tu rahije perîkê?**

Ez li ser hestê mirov di her tiştî de kar dikim, ji ber di xwezaya bê deng, asîman, kevir, u pela darekê de mirov xuya dibe, weke bijişkê ku nexweşan şirove dike, ez bi awayekî hunerî



eynî kar dikim, ji ber her kes nikare naveroka mirovan bibîne…

**3-di tabloyên te de êvar u şev bi awayekî zelal tên xuya kirin, Gelo çi riwê manendê di nav xwezayê u mirov di tabloyên Xunav Salih de ye?**

Sirûşt herdem nameyekê dide mirov, ji ber tiştê di xwezayê de heye di mirov de jî heye, u xwezaya war gelek bandor li min kiriye, dema ez bi tiştekî hizir dibim hest dikim ku nêzî mine, hinek ji wê êşa li dora me vedenga wê di perîka min de derdikeve..

**4-çi wateya rengên tarî u roniyên kolanan di tabloyên te de ye?**

Di destpêka nêgariya min de min êvar hilbijart lê nebû wek piroje, roniyên kolanan u yên malan bala min dikşand u min kar li ser wê kir, tevlî ku ronî di nêgariyê de zehmet e, lê di nerîna min de ronî ewe peyama ku mirov dixwaze bighîne gerdûnê, u wek raman gelek hêvî u bedewbûn tê de heye, u êvar xemgînî u şadî ye herweha rengên tarî u vekirî bedewbûnê didin tabloyê..

U di tabloyên min de ev wateye renga ye:

Rengê qehwe: ax e ji ber mirov ji axê çêdibe u ew nêzî hawîrdora me ye..

Şîn: rengê asîman e, u xweşbîniya mirov e..

Birteqalî: rengê agir u şoreşê ye..

Rengên tarî: şer u xemgînî ye..

Binefş: jinbûn u romantik e..

Sipî: mirovahî u dayik e..

**5- her tabloyek çiqas dem dixwaze ji bo bi dawî bibe, herweha hestê te dema tu nêgariyê dikî?**

Ji 3 ta 4 demjimêran dimînim u carcarn bi rojan dimîne, herweha dema nêgariyê dikim kêfxweş dibim, eynî wek ku ez şaha gerdûnê me, u ta niha min nêzî 100 tablo nêgar kirine…

**6-weke jinek Kurd tu ji bo çi nêgariyê dikî?**

Tevlî ku jimara jinên hunermend li Rojava kêm e, u yê hene jî ne di asteyeke bilind de ne, lê jin di riya hunerê de teqezkirina hebûna xwe dike, u divê her berdewam be, ji ber dema jin di vê riyê de dimeşe ew wekheviyekê di hindirê xwe de çêdike, herweha êş u derdê xwe bi rengek rast u bi sûde derdixe..

**7-di nerîna te de gelo tabloyên te nêgar kirine derbirîna kurahiya hestên te dikî?**

Hindirê min wek deryayekê ye u hîn ew derya ziwa ne bûye, her hestek min di tabloyekê de derdikeve, herweha di vê rewşa aloz ya Rojavayê Kurdistanê de mirov di şer de wenda ye, ji ber vê yekê ez nêgariya mirovan dikim, bi awayek balkêş bê ku riwên wan hebe, u kurahiya wan derdixim holê, herweha ez naxwazim di tabloyên min de jinbûn xuya bike ji ber ew wek qelsiyê dide..

**8-pilanên te ji bo pêşeroja "Xunav Salih" ya hunerî çi ye?**

Dixwazim pêşengehan li derve çêkim wek herêma Kurdistanê u u dewletên Erebî u li Ewropayê, bi rengekî ku nameya min bighêje hemî cîhanê, Herweha wek pirojeyekê heye ku ez hin xûleyên nêgariyê bidim kesên ku behremenda wan di vî warî de heye ..

**9-tu pêşeroja şêwekariyê li Rojavayê Kurdistanê li ku dibîne?**

Hunermend u şêwekar li Rojava hene lê piştigir tune ne, herweha divê têkilî di navbera hunermendên hindirê Rojava u dervê wê çêbibin, ji bo ku ronî here li ser wan kesên veşartî, ji ber milletê bê huner gereke tune be..

Xunav Hesen Salih hewl dike ku bi tabloyên xwe



kûrahiya mirov nêgar bike, mirovê ku bi hemû deman ve girêdayî, hestê mirov bi awayekî balkêş u nûjen derdixe, u rengin taybet bi dibistanên hunerî pêk tîne, bi şêweyekî ku hevjîniyê di navbera xwezayê u mirov di tabloyan de çêdike ..

**Hin ji Pêşingehên Xunav Salih:**

*Pêşingehek tekane bi navê"ji xêvezana êvarê" Beyrût 2004*

*Pêşingehek hevbeş bi navê"7+1" li Bêrn li Siwêsrayê 2004*

*Pêşingehek tekane li festîvala"Gelawêj" li Silêmaniyê 2013*

*Pêşingehek hevbeş li Helebê*

*Pêşingehek hevbeş li Şamê li hola firî hand*

*4 hevparî di pêşingehên ciwanan li wezareta rewşenbîriyê li Şamê bi tabloyekê bi navê "Newroz"*

*Pêşingehek tekane li hola Osman Sebrî li Qamişloyê..*



# Hevdîtinek bi zimanzanê kurd Ibrahîm Xelîl re

Raman Îsa

**Resûl Hemzatov,nivîskarê daxistanî yê bi nav û deng,dibêje:" Dibe ku di girê piçûk de Zêr Pirr hebe ",û bajarê Hesekê yek ji bajarên kurdî yên zengîn e,bi nivîskar,helbestvan û hunermendên xwe yî kurd yên welatpartêz,nemaze Seydayê Tîrêj,Salihê Heydo, Mehmûdê Sebrî. Herwiha jî,mêvanê me yê hevpeyvîna vê hejmarê,mamosta û zimanzanê kurd," IBRAHîM XELîL" e.**

Di hevdîtineke taybet de li gel Kovara Welat,nivîskarê kurd û mamostayê zimanê Ferensî Ibrahîm Xelîl ", derbarê Van pirsan,bi me re axivî û bersiv da. "

**1- Di despêkê de, hêvîdarim ku tu xwe bi xwênaran bidîNaskirin.**

Ibrahîm Xelîl sala 1972,li bajarê Hesekê çêbûme û lê dijîm,bi jin û zarok im ( Mehyar,Hêlîn, Mustefa ). Min wêjeya ferensî li zankoya Helebê xwendiye, û paş re diploma perwerdeyê stendiye,niha wek mamostayê zimanê ferensî li bajarê xwe kar dikim.

**2- Wek nivîskarekî kurd, di warê nivîsandinên xwe de,tê çi ji me re baxivî, û warên ku tu têde kar dikî çi ne?**

**Ji ber ku zimanê kurdî qedexe bû,min jî wek hezarên xort û keçên kurdan bi zimanê erebî dest bi xwendin û nivîsandinê kir.**

Nayê bîra min bi cih ez kengî ber bi wêjeyê ve çûm lê xweş tê bîra min ku karmendê "Navenda çandî ya Erebî " li Hesekê ne dihişt ez pirtûkan bi xwe re bibim malê ji ber ku min hîn nasnameya xwe dernexistibû.


Di wî temenê piçûk de,min baş pirtûkên Erebî yên kevn xwendin ku zimanê wan ji min re bû bingeh ta roja îro.

Di sala 1988 an de ez fêrî xwendin û nivîsandina zimanê Kurdî bûm, îdî min çîrok û gotar û wergerandin û lêkolîn bi herdu zimanan nivîsîn.

**3- Berhemên te çi ne,ew çapkirîne yan na ?.**

**Mixabin, ta roja îro yek pertûka min çapkirî tune.**

Berhemên min yên amade ji çapkirinê re evin :



( Gorin vala – çîrok bi Erebî ), ( Şopa lingekî – çîrok bi Erebî ), ( Wê çaxê – çîrok bi kurdî ), ( El-ecrûmiyya – lêkolîn di rêzimana kurdî de ), ( Orientales – çîrok bi ferensî ), ( Incîla Yûhenna – wergerandî bo kurdî ), ( Neige – romanek wergerandî ji ferensî bo kurdî ) , ( Siruştên zordestiyê – wergerandî bo kurdî ), ( Helbestên Cizîrî – wergerandî bo erebî ), ( çar pirtûkên gotaran bi zimanê erebî : olî, wêjeyî, siyasî, rexneyên civakî ) li gel ku ev serê çend salan kar dikim li ser ferhengeke êtîmolojî bo zimanê kurdî .

**4- Derbarî rola nivîskarên kurd li Sûryê nerîna te çi ye,û bi çi awayî kesên nivîskar dikarin bandorê li rêxistinên siyasî bikin ?**

Nivîskar nayê çêkirin,nivîskar ji ber xwe ve çêdibe.

Ez nivîskar didim naskirin wek tayekî nedîtî di navbera duh û îro de,di navbera mirov û mirov de,di navbera millet û destelatê de. Ew dîroka mirovatiyê ji çaxekê diguhêze çaxekê, ew rojeva gelan ronî dike,ew rêya rast û dirust pêş xelkên xwe dike,destê pênûsa xwe di ser serê qencan re dibe û tiliya xwe dixe çavên ên şaş û setemkaran de.

Ez dibînim ku erkê nivîskare,ku îro di rewşeke wek ya Sûrya û Kurdistanê de pirr girane, gerek ew dengê millet be di guhê siyasetmedar û destelatdaran de, û ew rêberê gelê xwe be bê şerm û bê tirs. Û xweşbextane ye ku îro

nivîskarê me bi vî erkî radibe nemaze ku dergehên alavên ragihandinê li pêş wî bi firehî hatine vekirin.

**5- Tu wek endamê YNK-S,li ser rewşa Yekîtiya Nivîskarên Kurd – Sûrya,tu çi daxivî,bi taybet di dema dawî de ?**

Yekîtiya Nivîskarên Kurd xewna me ya dîrokî bû. Bi şoreşa Sûrya re derfet ji me re hat ku em xwe bidin hev û rêxistineke wêjeyî damezrînin,rêxistineke şarewer û serbixwe ku hevalên hemû partiyên tevgera kurdî be lê ne di bin çengê tu kesî ji wan de be.

Lê mixabin,kurmê siyasetê xwe berda nav rehên dara meyî ter û li şûna ku em ji hev bên naskirin: ev helbestvane û ev çîroknivîse û ev lêkolînere,em bûn: ev hevalê filan partî ye,ev dostê filankese yan mirovê bêvankese…

**6- Tê ragihandin ku YNK-s bûyê du parçe,gelo çi sedemên van nakokiya ne?.**

YNK-S hîn yek dezgehe û xwedê hezbike ewê her bimîne yek,lê nayê veşartin ku nakokî di navbera endamine me de peydabûne. Ev nakokî du sedemên wan hene : yek jê,kesayetî ye ku hin ji hinan heznakin û naxwazin bi hev re kar bikin,ya din,siyasî ye ku her girûpek ji wan dixwaze YNK-S ji himbêza milletê kurd derxe û wê bike dûvik ji partiya xwe re bê sûc û sebeb. Lê nivîskarên kurd yên dilsoz Yekîtiya xwe bi mijankên çavan diparêzin nemaze xort û keçên meyî bajarê Hesekê,yên ku xwe dibînin wek " Dayika lawik " razî nabin ku lawik bibe du tîş lewra wan biryara xwe bi mêranî da ku van stiriyên nakokiyê bi destên xwe yî tazî hilkin û bibin şaxek ji YNK-S ya yekbûyî tenê re.

**7- Kovara Welat,wek kovareke çandî, giştî,serbixwe,nerînên te debarê karê welat de çi ye?**

çi kovara kurdî hebe serfiraziyeke,ne tenê ji milletê kurd re lê ji tevaya cîhanê re ji ber ku ew nîşana serkevtina zanînê dijî nezaniyê ye. Ez " Welat " dixwînim û dilxweşim bi rapor û mijarên wê,hêviya pêşketinê jê dikim. Têbîniyeke min tenê derbarê wê de heye ku ew bi tevayî bi kurdî be yan jî ew rûpelên xwe yî bi zimanê Erebî kêm zêde neke.

**8- Tu çi nameyan ji xort û keçên kurd re dişînî,ji boyî pêşerojê ?**

Nameya minî yekem: Zana zora hêzdaran bir,mirov ji mirov xurtire ne bi zend û bendê xwe lê bi hiş û mejiyê xwe. Va ye Amerîka,ku îro roj xatûna cîhanê ye,serê xwe bi zanayên xwe dipêçe,em hîn bi navê radibin hev,pirsgirêkên xwe bi kulman çareser dikin.

Nameya minî duyem: Em li hev guhdarî bikin,ji ber ku rastî nebûye gwîzek û neketiye tûrikê tu kesî. Her kes ji me xwedî felsefe û nerîneke ye di jiyanê de,bi gotineke din: ez çaran dixwazim û tu didwan didî min,ka em bi sêyan li hev werin.

Nameya sêyem: Em kar bikin ne ji bo îro tenê lê ji bo rojên pêş û nifşên hatî,em zanibin ku çi karê em îro bikin dibe bingeh ji bo sibe,gotina pêşiyên xwe ji bîr nekin: Rêwî diçe lê rê dimîne.

**bi vê pirsê em gihan dawiya hevdîtina xwe bi mamosta îbrahîm Xelîl re,Ta Hejmareke din ,di gel mêvanekî din û herwiha li bajarekî di,hûn bimînin di Xêr û Xweşiyê de.**



# غياب الأب عن الأسرة و أثر ذلك على الأبناء

كمره أيو

من المشكلات التي تؤدي إلى اضطراب الأدوار في الأسرة, مما يعتري الأسرة من تبدلات فيغيب عنها أحد الأدوار مما يؤدي إلى سد الفراغ بشكلٍ أو بآخر .

و في كل الأحوال فأن آثار ذلك تبدو واضحة على النمط السلوكي للأبناء و على مستقبلهم, من تلك المشكلات غياب الأب عن الأسرة و يكون هذا الغياب كُلياً بالوفاة أو جزئياً بالسفر أو الطلاق أو السجن. إن غياب الأب عن الأسرة يُحدث خللاً في اتجاهات الأبناء و قيمهم و نظرتهم للمستقبل, حيث يجد الأبناء في والدهم نموذجاً مثالياً رئيساً له, فالطفل الذكر يرى في الأب مثالاً عن الرجل و البنت تختال بوالدها و ترى فيه الإنسان الكامل, و كما يُقال :»كل فتاة بأبيها معجبةٌ!«.

يعاني الطفل في سن ما قبل المدرسة من غياب الأب اذي هو عون الأسرة و يؤثر ذلك على نفسيته و نموه الانفعالي, و كما هو معروف أن السنوات الخمس الأولى من عمر الطفل أساسية في حياته و تترك التربية فيها بصمات يبقى تأثيرها على شخصية الإنسان مدى الحياة.

إن الغياب الطويل للأب يترك الأبناء يكوّنون صورة خيالية عنه, و قد لا تتوافق هذه الصورة مع شخصيته الحقيقية و هذا قد يؤدي إلى اليأس و الاحباط و التمرّد, كما أن غياب الأب يحرّم الأطفال الذكور من خبرة الحياة مع شخص من جنسهم مما يحرمهم من استكمال المفاهيم التي يكوّنوها عن عالم الذكورة بفضل العلاقة مع الأب كما أن الطفل الذي يفقد أباه بسبب الموت يتأسف طيلة حياته لعدم وجوب الأب معه و خاصةً في المواقف الصعبة.

يُحدث غياب الأب اضطراب الهوية لدى الطفل, نتيجة افتقاره للصورة المرجعية للنموذج الأبوي الذي لا يتحقق إلا بوجود الأب داخل الأسرة و قيامه بدوره إلى جانب الأم, و في حال غياب الأب تتضاعف مسؤولية الأم و واجباتها و كلما كانت شخصية الأم قوية و فاعلة كلما استطاعت التعامل بكفاءة أكبر مع المشكلات التي تحصل في حال غياب الأب و لكنها لا تستطيع أن تكون بديلة عن الأب!

إن وجود الطفل مع الأم وحدها في أسرة سيقلل من درجة الذكورة لديه, و أيضاً يكون خطر الغياب على نمو الدور الجنسي للأولاد و البنات حيث يشكل عدم وضوح الدور الجنسي للأولاد و البنات أحد أسباب المشكلات و الاضطرابات التي تترك آثارها على مختلف أبعاد شخصيتهم.

إن تأثير الأب على الطفل في إطار الأسرة يتمحور في الآتي:

-التفاعل المباشر مع الطفل حيث يقوم معظم الآباء بحمل الصغير



خلال الأشهر الأولى من عمره و إن طريقة الحمل حيث يكون الأب و الطفل وجهاً لوجه تسمح بتطور العلاقة بين الطرفين.

-أهمية سلوك الأب في النمو الانفعالي و النفسي الذي يعيشه الأب في علاقته مع الطفل.

-توفير الدعم العاطفي للزوجة و الذي ينعكس أيجاباً على علاقة الأم بالطفل و الطفل بالأب.

-المدة الزمنية التي يقضيها الأب في البيت و أهمية ذلك في زيادة التفاعل و التوازن بين أفراد الأسرة.

-إن طبيعة عمل الأب تؤثر تأثيراً بالغاً في درجة اهتمامه بأطفاله, فالأب اذي يعود إلى البيت مُرهقاً بعد يوم عمل طويل لا يملك الطاقة كي يقوم بدوره, و الأب المسافر لا يستطيع الاهتمام بأطفاله و متابعة شؤونهم عن بُعد.

-تكون الأسرة في وجود الأب أكثر تعاوناً و تماسكاً حيث يُبدي الأب مشاركته في رعاية الأطفال.

-يحد من ظهور السلوك المنحرف عند الأطفال.

-فرض الانضباط في إطار الأسرة, و عدم مبالغة الأب في استخدام سلطته و عدم استخدامه للعنف و التسلّط.

-يؤثر الأب تأثيراً هاماً في التمايز الجنسي بين البنات و الأولاد و السعي نحو المساواة بين الجنسين.

إن موقع الأب في الأسرة يمكّنه من مواجهة معظم مشكلات الأسرة و بقدر ما تتسع ثقافته و معارفه و خبرته بقدر ما ينعكس هذا على أطفاله و سلوكهم و تربيتهم و تكيّفهم و تقدمهم الدراسي.

و الخلاصة, عندما يغيب الأب بداعي السفر الطويل للعمل مثلاً, يعتقد أنه يُلبّي بذلك رغبات و حاجات أبنائه و يرسل لهم النقود و رسائل الحب و الحنان و يوفر لهم حياة مستقرة اقتصادياً. إن هذا الأب يُضحي في سبيل تأمين العيش الرغيد للأسرة و هذا شيء جيد و مفيد و لكن دور الأب في الأسرة ليس جمع المال فقط بل توفير العطف و الحنان لأولاده, فوجوده بينهم اطمئنان و أمان

# Meydana Henêr Li »Pirsûsê»

**Şîrîn Temo**



Pirsûs Her bajarekî nîşan û cihine xwe yên navdar hene ku pê ew bajar têtê nasîn û naskirin û navê wî bajarî û wan cihan li ba her kesî bi hev ve girêdayî ne,weku em ji çi kesî re bibêjin "Şam", dê -berî her tiştî- çîyayê Qasîyon û Mizgeft ElEmewî bêtin bîr û bala wî,yan ku em jê re bibêjin "Parîs", dê birca Îvil û Kolana Şanzîlîzê bêtin bîr û balê,wiha jî heger ku em ji penaberekî Kobanî yê li Tirkiyê re bibêjin " Pirsûs (Suruc)" , dê –berî her tiştî- Meydana Henêr (Meydana Henar) bête bîr û bal û ber çavên wî. Bajarê Pirsûs(Suruc)ê, bajarekî Kurdan e,bi ser eyaleta Orfayê ve ye. Pirsûs bajarê "Tirkiyê" yê herî nêzîke ji Kobanîyê ve,şêniyên Pirsûsê Kurd in,şaredariya Pirsûsê di dest Partiya BDP ê de ye,li Pirsûsê sûkên têvel (zêr,keskayî, ….) hene,di navenda bajêr de meydanek ne pir mezin heye,li rexekî wê meydanê peykerekî Ataturk heye,li rexekî din peykerek din heye,ew peyker lepekî mirovan e,di nava wî lepî de henarek heye û wî henarî hişt ku navê wê meydanê bibe" Meydana Henêr(Henar)". Şeva dirêj ya ku di vê payîzê de baskên xwe yên giran bi ser Kobaniyê de vegirtin,û ew kire qada şer û pevçûneke mezin û giran û hişt ku hemî şêniyên wê bervî Tirkiyê û bi taybetî bervî bajarê Pirsûsê birevin,hişt ku gelek penaberên Kobaniyê –di despêka koçberbûnê de- gelek şev û rojên xwe li Meydana Henêr derbas bikin,belê ta pileya ku ew meydan,di demekê de,navnîşana gelek penaberên Kobaniyê bû. Li ser vê mijarê koçberekî Kobaniyî ku navê wî"Cemîl Ehmed" e dibêje:" piştî ku em ji Kobaniyê derketin,em gihiştin aliyê Tirkiyê, em têgihiştin ku em li bajarekî ne navê wî Pirsûs e. Cemîl dibêje ku tiştê her pêşîn, ku di wî bajarî de bala wî kişandî ew meydana ku di navenda bajêr de ye,ku di rexekî wê de peykerê lepekî henarek tê de heye". Meydana Henêr,hemî dost,heval û meriv,yên Kobaniyên li Pirsûsê, gihandin û digihîne hev, û bi taybetî di rojên koçberbûnê yên pêşîn de. Ew dost,heval û meriv dihatin ba hev,ta ku êş û derdên xwe ji hev re bibêjin,û li ber dilê hev bidin. Meydana Henêr li Pirsûsê,dîdrgeha şêniyên Kobaniyî yên li wir in e,ji bo ku ew hev bibînin,yan pêdiviyek ji hev bidest xînin yan alîkariyekê ji hev re pêşkêş bikin ew " li hindê henêr", li (Meydana Henêr) hev dibînin. Di vê derbarê de,keça Kobaniyî " Mizgîn Şêxo" dibêje:"cihê herî pêşîn ku me li Pirsûsê nas kir "Henar" (Meydana Henêr) bû,ev jî ji ber ku dîmena henêr gelekî bala me kişand. ji ber ku Mizgîn dibêje: Meydana henêr di navenda sûkê de ye,kengî em sozê hevdîtinekê didin merivekî yan nasekî xwe,teqez Meydana Henêr cihê wê hevdîtinê ye. Hêjayî gotinê ye ku "Meydana Henêr" qadek bû ji qadên Pirsûsê yên serek,yên ku rêxistinên mirovahî, dirêjahiya meha pêşîn ji penaberbûna Kobaniyan,xwarin û vexwarin li wir,ji wan penaberan re pêşkêş dikir,ev jî,ji ber ku komeke mezin ji penaberan her li wir dihate dîtin,û ta niha,gelek ji alîkariyen ku ji penaberan re têtin Pirsûsê,li Meydana Henêr,li penaberan têtin belavkirin,ev jî – weku me berê got – ji ber ku ew meydan qadeke mezin e,ji qadên ku Kobaniyî lê dicivin. Û wiha jî Meydana Henêr cihek ji cihên ku penaberên Kobaniyê lê nûçeyên şerê ku li welêt (Kobanî) diqewime werdigirin,û ew meydan cihê gotûbêjên siyasî yên wan penaberan e,çayxaneyên ku li kêlekên wê Meydanê ne,ew jî cihên vehesîn û gotûbêjên siyasî û ramangerî yên penaberên Kobaniyê ne. Di derbarê vê yekê de çalakvan Azad Kobanî dibêje: ku ew û heval û dostên wî,li Meydana Henêr her hev dibînin, ta ku binêrin, ka ew karin çi ji Kobaniyê re pêşkêş bikin, û çi karin pêşkêş bikin ji penaberan re, ta ku hinekî ji kul û keserên wan kêm bikin. "Henar" yan Meydana Henêr xaknîgariyeke din e – piştî Kobaniyê - ku xelkê Kobaniyê li dora xwe dicivîne .. xaknîgariyeke,wan ji belavbûna li cîhanê diparêze. Îro Pirsûs .. Meydana Henêr, ji Kobaniyan re,xaltîkeke, ku hilma dayika wan "Kobanî" ji wê tê,loma ew nikarin ji himbêza wê pir dûr kevin,tenê li wir,xelkê Kobaniyê, xerîbiyê hest nake .. li wir ew pêrgî heval û hogir û merivên xwe dibin û girnijînan li ser rûyên hev dikşînin û bi hev re tabloyeke çeleng ji " Kobaniya Siba" re dikşînin .. û soz didin hev,ku ew dê carê tê,ne li Meydana Henêr,lê li Kobaniyê .. hev bibînin.



# Taxa Filan li Serê Kaniyê kûr dinale

Lawikê Romî



Gelek dizanin ku ev her-sê salên dawî bi hemû êşên xwe bandorek awarte û bivîn li ser belvbûn û dûrketina gelek kom û kesan rûdaye li herêmê bi tevayî ji ber rewşên gefîniyê û kêmbûna aramiyê.Hêjayî gotinê ye ku ne tenê leşkerî û talan ev encam peyda kiriye,lêbelê aloziyên can jî rolek pir giring lîst di vî tiştî de.

Li Serê Kaniyê,taxa Filan ya ku her sal weke van rojan di şahî û kêfxweşiyê de derbasdibûn,bi bûna sala nû-Sersala Mesîhî-û meha bûyina peyxemberê ola Filan, lê bûye sê sal ku ev tax ji xweşiyê dûre,û gelek kesên vê taxê vê gave ji dervî welate,hin ji tirsa komên tundrew û hin jî ji ber rewşên aloz û wêran.

Ji pêkhatiya Filan 80% û bêtir jî vê gavê dervayî Serê Kaniyê ne,ango ji 223 malan vê gave tenê 17 mal mane,gelek ji wan berê xw dan Qamişlo-El wista , û Hesekê-Nasra û Kelasê û hinên di jî li Ewropa bûn mêvan, lê tirsa mezin ewe ku ev bajar ji rengekî sereke bêpar bimîne,û pirs ewe ku gelo tra kîjan astê ewê ev pêkhat li ser vê xakê bimîne?






# Dengê Urmiyê li Rojava vedide...

Xunav Kano

Di bin siya silogana " em bi te re ne Urmiyê " kampaniyak li Qamişlo dest pê kir, ew kampanya ku hat lidarxistin ji bo piştigitiya hepsiyên zindana Urmiyê li Rojhilatê Kurdistanê, yên ku ev nêzî 32 roj ketine gireva birçîbûnê de, piştî stendina biryarê bi sêdarkirina hin ji hevalên wan, u cîbecêkirina fermana sêdarkirina 6 hepsiyên din yên ku piştigiriya xwe didan berxwedana Kobanê, kampanya ku ji aliyê hin çalakvan u hunermend u nîviskaran pêk dihat, u ji xwepêşindan, şano u staranan çêbû, li hin bajarên din jî li darket, weke Serêkaniyê u Dêrikê, herweha komîtek taybet ji bo rêvebiriya vê kampanyê hat rêxistkirin, kampanya bi guhertina wêneyên fêsbûkê destpêkir, duvre rûpelek taybet bi navê " em bi te re ne Urmiyê "di fêsbûkê de hat çêkirin, u belavkirina wêneyên girêdayî bi kampanyê li kolanên Qamişlo, herweha pêşkêşkirina şanoyeke taybet bi bûyerê, ji aliyê şanoger " Ebdulrehman Ibrahîm" li kolana " Mûnîr Hebîb", u piştigiriyeke mûzîkê jî hat pêşkêşkirin ji aliyê hunermend "Ciwan Cemîl" ve u koma wî ya bi navê"saz music", bi çend stranên taybet bi Urmiyê, derhêner "Şêro Hindê" derbarê vê kampanyê ji kovara "Welat" re dibêje:

" ev kampanya ji bo girêdan u têkiliyê bi hêztir bike di navbera şoreşa Rojava u Rojhilatê Kurdistanê de, bitaybetî ew kesên ku hatine girtin piştî xwepêşindanekê ji bo piştigiriya berxwedana Kobanê, li bajarê Sinê nêzî 500 kesî hat girtin, herweha li zanîngeha Tehranê u li Urmiyê, ji ber vê yekê girêdaneke Kurdistanî di navbera gireva birçîbûnê li Urmiyê u berxwedana Kobanê de heye"

Herweha "Hindê" derbarê kampanyê got:

Ji ber ku çavê hemû ragihandina dûnyayê li ser Rojavayê Kurdistanê ye, me xwest em vê derfetê bikar bînin ji bo em çavê ragihandinê li ser pirsigrêkeke Kurdistanî vekin, wek berxwedana Urmiyê li Rojhilatê Kurdistanê, Herweha ev çalakî li Amedê, Hewlêrê, Cinêvê, Kolin, Firankfort, Istokholmê, Biroksêl, Siwêdê, u li Feransayê u hin bajarên din hat li darxistin..

"Hindê" da xûyakirin ku hewldan hene ku vê bûyerê bighînin yasayên navnetewî…

"Ciwan Cemîl" hunermend e beşdarî kampanya"Em bi te re Urmiyê" bû u ji kovara "Welat" re dibêje:

Wek koma"Saz mûsic" me xwest em beşdarî vê kampanyê bibin, bitaybetî ku koma me ji zarokan pêk tê, piştigiriya berxwedana zindana Urmiyê bi deng u saza xwe bikin, Herweha hestê Kurdistanî li ba zarokên Qamişlo bihêztir bikin"

Çand, huner, nîvisandin u rojnamegerî xeleka ku tu carî ji hev cûda nabe, u sînoran li ber xwe radike, herweha ew berxwedana herî gewre ye li welatên ku azadî li wan tune ye, weke Îranê..ji ber vê yekê herdem dirûşm silavê li kesên paş hesinên zindanan u werîsê sêdarkirinê dikin, Rojava qêrînê dike u dibêje: " bijî berxwedana zindana Urmiyê " u Rojhilat jî vedgerîne: " bijî berxwedana Kobanê "…







# Lîfik êdî tê jibîrkirin

Giyaya bi navê lîfik ku ji bo serşuştinê dihat bikar anîn, her wiha yek ji gihayên xemla ber deriyên malan bû, êdî tê jibîrkirin.

Giyaya lîfik yek ji gihayên ku dikare bi dîwaran ve hilkişe û di demên berê de ji bo ku di serşûştinê de bê bikaranîn, dihat çandin.

Ji ber ku çandina giyaya lîfik pir hêsan e û tu xwedîkirineke tayebet jêre pêwîst nake, li nava daran û li nêzî dîwaran dihat çandin. Dirêjbûna wê dighêje 15 metereyan û ji bo xweşikbûna malê û her wiha sûdgirtina ji berhemên wê di serşûştinê de, tê bikaranîn.

Piştî ku lîfa şûştinê ya sînayî ku di hemû werzan de amede ye belav bû, êdî ev giya nedihat çandin. Giyayê lîfikê di werza biharê de tê çandin û hetanî werza payîzê berhem dide. Piştî ku berhemên vê giyayê dirêj dibin û rengê wan zer dibe, qalikên wan tên rakirin , ji dendikan tên valakirin û ji bo ku zuha bibin demekê tê hiştin. Piştî wê ji bo bikaranînê amede dibe.

Li navçeya şiyê ya herêma Efrînê, kêm cotkar mane ku hîn vê giyayê diçînin. Yek ji cotkarên navçeyê derbarê çandina vê giyayê de got ku giyaya lîfikê zû mezin dibe, di biharê de tê çandin û di despêka havînê de gulên bi rengê zer dide. Piştî wê jî berhemên bi navê (kûz) dide.

Cotakar her wiha destnîşan kir ku her yek ji giyaya lîfikê salane 20 berhemên bi navê kûz dide. Ji ber ku berhemên giyaya lîfikê bi zêdebûna germahiya avê re xera nabe ew berhem dikarin pêdiviyên malbatekê yên serşûştinê, di dirêjahiya salekê de bi cih bîne her wiha di aliyê tenduristiyê de jî laşê mirovan diparêze û çerm geş dike.

**Jêder Hawar.**





# Cotkar cureyên nû yên çandinîyê bi kar tînin

## Gulal liyanî

Her sal wek vê demê cotkar ê herêma Girkê Legê bi dest çandina zevîyan dikin.

Herêma Girkê legê bi çendinîya (genim û ceh, nîsk û nokan) tê naskirin

Lê di vê salê de,bi sedema kêmanî û giranbûna pêdivîyên çandinîya van cureyan wek Tov û semad,cotkaran berê xwe daye çendnîya cureyên nû, wek Kemûn û Kizbera.

li ser vê babetê Mihamed Emîn cotkariye ji Girkê legê got : Di sala bûrî de me gelek astengîyên kêmanîya pêdivîyên çandinya cureyên serke,me dît piranîya pêdiviyên me bi buhayik bilind ji bazara reş di kirîn ji lewra



vê salê de me cureyên nû bi kar anîn bi teybet kemûn û kizbera.


Cotkarkî dî Newaf da xuyanî û got: ta niha me nirxê genim yê sala bûrî bi dest nexistîy,lê cureyên din wek kemûn kizbera,barizgan van her diwan dikirin,ev sedma serke ye,ku cotkar berê xwe didine cureyên din.

cotkarî karekî serke ye ji welatîyên herêma Girkê legê re tevî wilo jî ta vê demê tu alîkarî bi cotkar re nebûye,sal bi sal rewşa cotkarên herêmê dijwartir dibe,gotina wan bûye sal bi sal xwezî bi par.



# Rewşa civaka sivîl li bajarê Amûdê

Mihemed Alûcî





Piştî gûrbûna agirê şoreşê li Sûryê,û vekişîna hêzên ewlekarî yên rêcîmê ji deverên Kurdî,gelek komeleyên ku di warê civaka sivîl de kardikin hatin damezrandin. Hin ji wan ên hawarhatinê ,û hin yên taybetin bi geşepêdana behreyên zarokan ,û serpereştya jinê.

Bi gelek nav ,û gelek rengan komelên corbicor hatin damezandin.

Di dspêka damezrandina xwe de li bajarê Amûdê,hin ji van komelan roleke baş lîztin,û xizmeteke berbiçav ji welatyan re kirin ,û bi taybetî di warê hawarhatinê de

lê pirbûna jimareya wan li bajarekî biçûk wek bajarê Amûdê bû cihê rexneyê ji gelek aliyan ve,gelek ji van komelan di bin heman nav ,û heman druşmê de kar dikin,û xelk îdî gazinan ji karê wan dikin,û bi taybet ji ewên ku karê mirovahî dikin,gelek welatî dibêjin ku ew bi wekhevî alîkariyan belav nakin,û para mezin li ser dost û hevalên wan kesên ku têde kardikin tê belavkirin ku piraniya wan dewlemendin û pêwîstiya wan bi alîkariyê tuneye,di demekê de ku ew para gelek mabatên hejar dixwin,û wan bêpar dikin ji van alîkaryan.

Ne tenê di nav komelên hawarhatinê de gendelî bûye ,lê di nav komelên civakî û rewşenbîrî de jî gendelî diyar dibe,û hin komele jî tenê wek dîkor hatine damezrndin ,û di bin navê avakirina civaka sivîl de kar dikin,lê di rastî de tu girêdana wan pêve tuneye,û tenê armanca wan bidestxistina pişgiriya diravî ji aliyên alîkaran ve.

Xelk îdî tore bûne ji pirbûna van rêxistinan,û li hemû derê basa gendeliya ku di nav wan de heye dikin.

Lewma pirsyarek li cem her kesî çêdibe: ma gelo bi rastî tiştek li vî bajarî heye bi navê civaka sivîl,yan ev tenê cûreyek nû ji bazirganiyê ye??

Kesek nikare bersiva vê pirsê bide,wek pêşiyên me dibêjin(golikek navê garanekê xerab dike!) lewma mirov nikare her kesî bike wek hev,lê ya rast ewe ku ev ezmûneke nû ye li ser gelê me,û bêguman wê kêmanî jî hebin,û wê kesên keysbaz û gendel jî hebin,lê ya giring ewe ku birastî kesin dilpak û xêrxwaz hebin û karekî pak û durist ji milet re bikin.



# Rewşa komeleyên xêrxwaz li Dirbêsiyê

## Sadûn Sîno



Li parêzgeha Hesekê û ji despêka vê rewşa xerab,gelek sazî û dezgehên xêrxwaziyê hatin damezirandin,û tevaya van dezgehan,bi durûşmên alîkariyê bandikin,bi taybet alîkariya kesên xêzan,ji xwe li bajarê Dirbêsiyê 5 dezgeh hene ku di vî warî kar dikin,lê di demên dawî de ew kesên ku rêvebiriya van saziyan dikin,pir guman li dora wan heye û ji aliyê welatiyên bajêr têne tawanbarkirin,ku ew tene li mirovên xwe xwedî derdikevin,û alikariyan ji malbatên xwe re pêşkêşdikin. ev jî li gor nerîna Sîpan Mûsa " welatî "

herwiha di heman mijarê de,û di hevdîtinekê de li ger kovara Welat,Şoreş mecîd,diyar kir ,ku di dema dawî de gelek civat li navenda xwecehî ya ENKS li bajarê Dirbêsiyê hatin lidarxistin ji boyî çareserkirina vê pisgirêkê,û gelek rapor ji welatiyan radestî Encumena xwecehî bûn,bi mebesta ku Encumen bi xwe beşder be dema ku alîkarî têne belavkirin ji aliyê van saziyan.

Ji aliyê xwe ve Viyan melle," yek ji Endamên van Dezgehan "

Anî ziman ku em alîkariyan belavdikin,li gor serjimarên ku di demên berê de hatine kirin ,û tevaya malbatên xizan hatine destnîşankirin,û li gor vê lîsteyê em kardikin.

Hêjaye bibîrxistinê ye ku ev dezgehên xêrxwaz ên ku li Dirbêsiyê kar dikin,alîkariya wan ya darayî ji hin rêxistinên hawarçûnê yê navdewletî tê kirin,û herwiha hi kesên maldar yên ku li derveyî welat dijîn,alikariyê dikin, lê ya herî balkêş ew e ku tevaya van saziyan ji aliyê hin malbatan li bajêr têne bi rêvebirin.

Li vir wek tê gotin,di navbera tawanbariyê û ne tawanbariyê de û di dema ku lêpirsîn li ser belavkirina alîkariyan tune ye,pirsa ku tê kirin,gelo ta çi astê ev dezgeh û saziyên xêrxwaz,alîkariyên xwe bi awayekî rast û durist belavdikin?

an jî li gor şiroveyên beşkî ji welatiyên bajêr,dibe ku di demên bê de,navnîşana van dezgehan bê guhertin,û bi " dezgehên malbatî bêne naskirin ".



# Nêt Kafê li gundewarên Dêrikê

## Fene Ehmed




Ji ber ku enternêt bûye giringiyek ji pêdiviyê jiyanê,li seranserî cîhanê xelek bi kartênin,îdî nema dikarin dest jê berdin. Îro li sûriyê bi sedema koçerbûna ne xuristî û bê sînor ku miletê wê li dewletên derdora wê û ewropa bûne penaber,Enternêt bûye pêdiviyek di her mal,gund û bajarekî de.

Bi sedema tunebûna wê bi rengê fermî,ji bêtirî du salan ve,şêneyên deverê enternêta asmanî bikartînin,ji loma şêniyên gunda hemî karînên xwe dikin ku li gorî pêşketinên teknîkî bin.

Ji ber vê yekê Nêt kafê,li gundan têne vekirn mîna hemî bajaran.

Nebîl Yêsif ciwaneke ji gundê Til Xenzîr li herêma Dêrikê,xwest ku xizmetguzariya gundiyan bike û jêdireke pê jiyan bibe, Nêt kafê li gundê xwe,di xaniyê xweyî axî de vekir,îdî şêniyên

Nebîl li ser vê xalê wiha axivî: Piraniya xortên gund li dervî welêt in,hin ji wan li Kurdistanê ji xwe re dixbitin,hin li ewropa penaberbûne,xwediyên wan li gund in û hewcedarin ku peywendiyê bi zarwên xwe re bikin,loma min dît pêdiveyke ku ez enternêtê ji gund re peyda bikim,min burcî jî bo belavkirina Warlês siwarkiriye,ta ku gundî di malên xwe de,bi Mûbaylan jî karibin enternêtê bi şopînin.

Masûm Ehmed xewndkarek ji Til Xenzîr e,nedekarî biçe Şamê da ku xwendina ya sala diwan berdewam bike,li cem dê ê baê xwe li gund maye,lê xwîşk,bira û pismaên wî li derveyî welêt in,masûm pir bi vî pirojeyî şad û bextewr e, ku derfet jê re vekiriye,dikare bi hêsanî têkilî û peywendiyê bi wan re bike.

Masûm derbarî vê yekê wiha axivî: Bira,heval û dostên min hemî li derve ne,bêriya wan dikim,ji ber wilo ez bi tenahiyê hest dibûm,pir caran ez diçûme Dêrikê da ku peywendiyê bi wan re bikim,çûna Dêrikê êşeke rasteqîn bû,lê niha pêwendî û pelandina enrtnêtê pir hêsan e.

Pêdivî dayika afirandinê ye,her demî mirov ji peydakirna şêweyên nû ji iyaneke xweş re xebitye.



# Gundê Leylan û şaristaniya 4 hezar sal

Girê Leylan yek ji şûnwarên kevnar ên devera Sinceqê ya Bajarê Tirbespiyê ye. Şahidiya şaristaniya ku temenê wê 4 hezar sal in, kiriye û heta niha jî bi gundê Leylan ê ku li rex wî hatiye avakirin, bi jiyanê geş dibe.

Herêma Mezopotamiya dergûşa mirovahiyê ye. Neqşên ku li ser erd û çiyayên wê hatine nexşkirin vê yekê baş rave dike. Piraniya çiyayên Kurdistanê nûnertiya bingeha avahiyên ku civakan beriya zayînê bi hezar salan têde jiyan dikirin, dike. Rojavayê Kurdistanê jî tevî ku çiyayên wê kêm in, lê gelek girên ku dîroka şaristaniyê hembêz kirine û temênê wan vedigere berî zayendê bi 4 hezar sal, li herêmê tên dîtin. Yek ji van giran jî Girê Leylan ê kevnar e.

Girê leylan 8 kîlometreyan li bakûrê bajarê Tirbespiyê yê girêdayî herêma Cizîrê dikeve. Ew weke bajarekî ku ji aliyê bav û kalên kurdan (horiyan ) ve hatiye avakirin. Dîroka vî girî vedigere 4 hezar sal berî zayînê. Di wê demê bi navê bajarê (Şexne) dihat naskirin. Piştî ku qiralê Aşûriyan Hamsha Adad dest danî ser, qesra lê avakir û navê wê bû shpt Anlîl.

Li gorî ku şêniyên gund dibênjin, gelek lêkolîn di gir de hatine kirin. Di encama lêkolînan de gelek tabloyên (reqem) ji heriyê hatine dîtin. Ew tablo jî têkiliyên siyasî û aborî yên di navbera qiraliyeta Şexne û qiraliyetên din yên di wê demê, de nîşan dide.

Di encama lêkolînan de her wiha diyar dibe ku ew bajar ji aliyê çandiniyê ve pêşketî bûye û bi taybet jî çandina genim. Girîngiya vî bajarê jî cihê wê yê stratîjîk tê, ku weke riya di navbera Aşûr û Anadoliya de dihat bikar anîn. Her wiha di vî bajarî de qesrekî ku ji 15 odeyan û perestgehekê pêk tê, hatine vedîtin.

Hin lêkolînvan dibêjin ku dîroka Leylan vedigere serdema Til Xelef. Ev jî diyar dike ku mirov ji beriya 8 hezar sal li vir jiyan dikirin. Li derdora gir şopên dîwarekî ku ji bo parastina bajêr ji êrîşan hatiye avakirin, tê xuya kirin.

Çîrokên di bala şêniyên herêmê de

Tevî ku dîroka herêmê pir kevn e û şaristaniyeke ji hezaran salan ve di bin axa wê de hatine veşartin jî, lê şopên buyerên ku di ser vê herêmê re derbas bûne hîn weke çîrokan di nava gelê herêmê de tên gotin .

Ji van çîrokan jî çîroka gora Şêx Miskîn, Aşav û gundê Leylana Bunya Biriyê (Leylana jêrîn) e. Her yek ji van jî çêrokeke wê heye. Li gorî tê gotin Şêx Miskîn ji bo ku genimê xwe bihêre ji aliyê Rojhilat ve hatiye. Lê di encama guleyê fermandarekî Fransî de ku li ser gir bû hatiye kuştin û li heman cihî hatiye veşartin.

Lê derbarê Aşav de jî heta roja îro ji aliyê rojava-bakûrê ve şopên diyar li jêra gir tên dîtin. Welatiyê bi navê Hec Hemê derbarê Aşavê de tişta ku tê bîra wî ji me re wiha vegot: "Beriya nêzî 60 salan ez hatime vî gundî, di wê demê de Aşav dixebtî û li herêmê tenê ev Aşav hebû. welatiyan bi hesp û hêştiran dihatin û genimên xwe dihêrandin. Ava Aşav jî ji sê bîrên Cerah a girêdayî Tirbespiyê dihat û aş pê dihat gerandin."

Derbarê dîroka nûjen a vî gundî de welatiyekî ji gund wiha got: "Gund nêzî 200 sal ber ji aliyê malbata Yûsif a ji Êla Kaska ya Kurd ve hatiye avakirin û hêjî di gund de ne. Di wê demê bi navê "Leylana Bunya Jêrîn" an jî "Leylana Bunya beriyê" dihat naskirin. Heta roja îro ev gund geş e û bi zevî û dewlendiya axa xwe tê naskirin."

Jêder Hawar



# Hesekê... û rewşa abûrî ya aloz

Salar Salih

Ji destpêka şoreşa Sûriyê ve,ta dema niha nişteciyên bajarê Hesekê di rewşeke abûrî aloz de dijîn,ku roj bi roj pêdiviyên jiyanê ber bi buhabûnê ve diçin,û welatî bi giştî û bi taybet fermanber û karker nikarin hemû pêdiviyên xwe bicih bînin,lewra pirên wan di penaberiyê de çareseriyek guncaw dibînin,derfetên ku mirov du karên cuda jî bike pir kêm in,çimkî gelek kargeh,firoşgeh û dikan hatin girtin û xwediyên wan koçkirin ji ber tirsa wan ji rewşa ewlehiyê ya netebût li bajar.

Wek nimûne ezê li ser rewşa fermanberan baxêvim :

Berî ku şoreş destpêbike mûçeyê fermanber digihişt 15000 leyrê Sûrî ango nêzîkî 300 dolarê Emrîkî dikir,digel ku pêdiviyên jiyanê bi nirxekî erzan dihatin firotin û guncaw bûn bi nirxê mûçe re,di encamê de fermanber di rewşeke baş de jiyana xwe diqedand,piştî ku şoreşê destpêkir nirxê perên sûrî li himber dolarê Emrîkî nizim bû ta gihişt astekê ku niha 200 leyrê Sûrî dike nêzîkî 1 dolarê Emrîkî,ango mûçeyê fermanber yê ku dighêje 20000 leyrê Sûrî tê himberî 100 dolarê Emrîkî, digel ku hemû pêdiviyên jiyanê sê çar taq buha bûne,mûçeyê fermanber bi vî nirxê nizim nikare hemû pêdiviyên jiyanê yên sereke jê re bicih bîne,herweha gelek kesên dîtir jî ji bilî fermanberan di heman rewşê de ne,jiyanek dijwar diqedînin.

Rêjîma Ba'as vê yekê bi xurtî diçewsîne,mûçeyên bilind dide wan kesên ku xwebexş dikin di hêzên alîgirên Rêjîmê de,ku nêzîkî 250 ta 300 dolarê Emrîkî mehane dide wî kesê ku tevlî nav refê wan hêzan dibe û xizmeta leşkerî têde dike,piraniyawan kesên xwebexş dikin di hêzên Rêjîmê de ji ber dijwariya rewşa xwe ya abûrî diçin,ku nikarin pêdiviyên kufletê



xwe bicih bikin,naçar dibin ku di hêzên Rêjîmê de xwebexş bikin û mûçeyekî bilind wergirin,wek nimûne Bavê Ehmed ji taxa Xiwêran mirovekî fermanber e,mûçeyê wî dighêje 90 dolarê Emrîkî,ew nikare bi vî mûçeyî pêdiviyên kufletê xwe ku 8 neferin bicih bike,lewra ew niha dixwaze xwebexş bike di hêzên Rêjîmê de, tevî ku ew bi vî karî ne bawer e,çiku ew dibêje: "yan ezê mirovekî bikujim,yan jî wê hinek min bikujin,lê ez çibkim,naçarim,divê ku ez hemû pêdiviyên zarokên xwe bidestxînim".

Di vî alî de dezgehên civaka sivîl û bi taybetî dezgehên xêrxwaz dikarin rolek giring bilîzin, ku destê alîkariyê bidin van kesê xizan mîna Bavê Ehmed û kesên wek wî tevî ku fermanber bin jî û xwedî mûçe bin,lê ew pêwîstî alîkariyê ne,ta ku hin layenên siyasî rewşa wan ya dijwar neçewsînin û wan nexin xizmeta armancên xwe de,ji layekî dî ve gereke civaka navnetewî piştgiriya dezgehên civaka sivîl yên xêrxwaz bikin da ku karibin bi rola xwe rabin,ev piştgirî bi gelek şêweyan dibe,piştgiriya diravî û vekirina xulên fêrkirinê li ser civaka sivîl û karê xêrxwaziyê, şandina turumpêlên alîkariyan bi hemû cureyên xwe,wek: cil,xwarin, derman,pêdiviyên xwendinê û şagirtan, pêdiviyên jiyanê,û damezirandina hin projeyên geşpêdanê yên biçûk ji bo peydakirina derfetên kar ji kesên bêkar re.

# Diyardeya Koçberiya Xwendekaran li Hesekê .

Raman Îsa




Bêguman ji destpêka vê rewşa awarte ya ku Sûriyê têde derbas dibe,û ji dema ku berê şoreşa aştiyane kete warê çekdariya malwêran,diyare ku herêmên Kurdî jî,ji vê bobelatiyê bêpar neman,çi ji hêla ewlehî û çi ji abûrî,tenduritî û zanistî,ji hêleke din ve,ev bi tevahî bûne sedem ku dergehê koçberiyê werin vekirin,bi taybet koçberiya xort û ciwanan .

Ji xwe bajarê Hesekê bûye nemûneyek ji vê rewşê re,dema ku beşekî pir mezin ji xwendekarên zanîngehan koçber dibin,dibe ku mirov carcaran matmayî bimîne,lê eger rewşa xwendekarên Kurd ji nêz ve were şopandin,û ew alozî û astengiyên ku li pêş tevgera xwendekaran hatine danîn bêne şirovekirin,bêguman ewê sedemên koçberiya van xortan jî destnîşan bibin.

Lê ji ber ku di dema dawî de ev pirsgirêk bûye mijara herî girîng ku xwendekar li ser radiwestin,pirojeyek ji aliyê Komela xwendekarên Kurd hat pêşkêşkirin,ku hevdîtinek gotubêjî taybet bi mijara " Astengiyên xwendekaran " lidarxistin .

û ev hevdîtin di 26\11\2014an de li Hola Cegerxwîn hat lidarxistin,bi beşdariya 4 mamosteyên Zanîngeha Hesekê,û beşek xwendekar ji tevaya kolêjan,xalên serekî di vê hevdîtinê de ew bû,mijara astinegiên ku li pêş xwendekarên Kurd têne danîn,li zankoya Hesekê û çawaniya çareserkirina van kêşeyan .

* derbarê vê pirsgirêkê,yek ji xwendekarên kolêja Yasa," Dilşad Ebdo" û di hevdîtineke taybet bi kovara Welat destnîşankir ku xwendekarên Kurd li zankoya Hesekê rastî pir aloziyan tên,û ev rewş bû sedem ku beşekî mezin ji xwendekaran neçar bimînin ku penaber bibin,herweha Dilşad anî ziman ku nayê wê wateyê ku xwendekarên Kurd li zanîngehan nemane,belê beşekî din ji wan hêj berdewamin di xwendina xwe de,bi taybet ew kesên ku demek kurt ji derçûna wan re mayê,ew neçarin ku beşdarbin li kolêjên xwe.

* di heman mijarê de,xwendekar" Cûdî bengo " ji Welat re diyar kir ku ne tenê astengî bûne sedem ji koçberiya van xortan re,lê ew nakokiyên rêzanî yê di navbera xwendekaran de,rojane zêde dibin,û ev jî ji ber bandora partî û rêxistinan li beşekî ji van xwendekaran .

Bi vî awayî rewşa xwendekarên Kurd li Zankoya Hesekê,ji nêz ve tê şopandin,û hemû kêşe û pirsgirêkên girêdayî bi vê mijarê berçav dibin ,lê pirs ewe ku bi çi awayî dê ev rewş bê çareserkirin,û kî berbirse ji boyî çareserinê







# Nexweşîya Şewbê

Dr. Abdulwahab Hacî



Şewb nexweşîya mehên zivistanê ye, ji ber vîrûsên şewbê di cemedê de pir ektîv û çalak dibin,nexweşî bi gelemperî li sîstêma bakêş û ba derê dixe, bi taybetî bêvil û gewrîyê.

kurdan navê nexweşîyê pir bi zanistî lêkirine,gelo cima?

wek hûn hemî dizanin ku kurdan ava vexwarinê ji bo mehên havînê bi cemide di xistin cêr û kûzikan de,lê dema ku ew cêr û kûzik li ber tavika havînê gelkî diman,digotin cêrê me şewibiye,ev dihat wateya ku av jê diherike u nema xwe tê de digre .

şewba bêvil û gewrîyê jî wek a cêre av bi piranî ji bêvil û gewrîyê derdikeve,ev derketina ava bêvil û gewrîyê,vîrûsan ji bêvilê dike der û bêvilê paqijdike.

Nîşanên nexweşîyê :

-Bêvil herikandin.
-Pişikandin.
-Ser êş.
-Çav û gewrî şewtandin.
-Lawazîyek giştî û sist bûna laşê mirov.
-Êşa movikan .
-Bilind bûna pileya germîya laşê mirov.

Çend şîret ji bo parastinê ji nexweşîya Şewbê:

1- Bi zêdebûn xwarina şînî û meywe,bi taybetî yên ku zengînin bi vîtamîn C . Wek leymûn, oranc û beqdûnis.

2- Bikar anîna dermanê vîtamîn C yê ku di derman xanadan tên firotin.

3- Sibehê zû xwe bidin ber tîrêjên rojê,ji ber tîrêjên rojê vîtamîn D di laş de dafirînê,vîtamîn D bi xwe berxwedana laşê mirov li hemberî nexweşîyan zêdedike.

4- Bi piranî mast bi kar bînin,ji ber Mast bektêrîyên bi sûde di laşê mirovde xurt û çalak dike.

5-Ve xwarina avê pirbikin ji kêmayî ji 6 ta 8 peyalan ( qedeh) di rojê de.

6- Ji deverên ku milet lê pir be dûr kevin.

7- Destê xwe nedin kesekî nexweş û alavên wî yên taybet bi kar ne ênin.

8- Bi zêdebûn destê xwe bişon.

9- Dema ku hûn silav bikin li kesekî nexweş,telîyên xwe nexin dev û bêvila xwe.

10 - Demek baş xewbikin ji ber xewkirin sîstêma ber xwedana laş saz û sererast dike.

Hêvîdarim ku hûn nexweş nekevin



# Xweşnav Heso

## PEYVA WENDAYÎ

**(Xapînok-mîdas-gewrê-gul-rûgeşê-lewendê-delalê-şahînazê-nesrîn-şêla-şêrîn-can-laleş-dil-zal-tu-amoş-novîn-xan-perî).**

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| l | g | l | e | w | e | n | d | ê | n |
| i | e | r | ê | L | a | l | e | d | o |
| d | w | ş | ş | ê | r | î | n | e | v |
| k | r | g | a | n | l | a | x | w | î |
| o | ê | ş | u | h | e | a | m | a | n |
| n | m | î | a | l | î | s | l | o | n |
| î | î | z | r | l | c | n | r | e | ş |
| p | d | t | a | e | ê | a | a | î | ş |
| a | a | e | u | l | p | ş | n | z | n |
| x | s | r | û | g | e | ş | ê | n | ê |

Peyva wendayî ji 6 tîpa pêktê,navê xanima mîr Celadet Bedirxan e.

| | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | |

## Jimara bi tenê

**Cihê vala di her malikê de bi jimara gerek dagre, lê divê ku tenê carekê jimar were dagrtin di her malekê de, û herweha divê ku tenê carekê were dagrtin li ser xêza asoyî û serjêr .**

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 5 | | 8 | 4 | | | | 7 |
| | | 7 | 2 | | | 9 | 5 | |
| | 4 | | 6 | | | 1 | | |
| | 2 | 5 | | 9 | 1 | 7 | | |
| | 1 | | 4 | | | | 3 | |
| | | 6 | 5 | | | 2 | 9 | |
| | | 4 | | | 6 | | 1 | |
| | 9 | 3 | | | 4 | 8 | | |
| 2 | | | | 3 | 5 | | 7 | 9 |

## XAÇERÊZ

**Asoyî**

*1-sûlav – tersê hat.*
*2-ji zayinê ye- dera berz ku û hemberî ba.*
*3-kom.*
*4-sinc(b)-ji axînê re.*
*5-paytexta komara Qadî Mihemed.*
*6-tersê şiyarbûnê-tersê rabe.*
*7-tersê belê(b)-bo nîşana me .*
*8-belgeya dawîkirina zanistanê.*

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | | | | ■ | | |
| 2 | | | ■ | | | | | |
| 3 | | ■ | ■ | | | | | ■ |
| 4 | | | | | ■ | ■ | | |
| 5 | ■ | | | | | | | |
| 6 | | | | ■ | | | | |
| 7 | | | ■ | | | ■ | | |
| 8 | | | | | | | ■ | |

**Serjêr**

*1-êş – şan.*
*2-tê vexwarin(b)-aramî.*
*3-ji balefire ye .*
*4-dera ku weşana radio dike-agir(b).*
*5-tersê jêr-navekî lawan.*
*6-tersê dereng-tersê nebû.*
*7-dera afirandina pirtûkan.*
*8-tersê kevin(b)-yê ku ji Adem be.*



## Ferhengok

| | |
|---|---|
| جريمة | Tawan |
| طَعم | Tad –çêj |
| ظهير | Piştevan |
| عذب | Waşo - Sazgar |
| غمامة | Pele ewr |
| فتوة | Lawînî |
| جزاء(للخير) | Padaş |
| جزاء(للشر) | Siza |

## PEND Û ŞÎRETÊN KURDÎ

1. **Bimre lê dest li ber kesî venegre!**
2. **Kurê bira nabe bira!**
3. **Piştî tengayê ferehî ye!**
4. **Jina xwe gelekî neşîne mala bavê!**
5. **Hîn mişkê male ne bihîstiye!**

توزع مجـــاناً

# DÊRIK...

## CÊWIYA ÇIYA Û ÇEMAN



welatpress2014@gmail.com
www.facebook.com/Dengekurdistanasurya

Welat
ولات: مجلة شهرية ثقافية عامة
العدد (١٧) ٢٠١٥/١/١